NEWROZ

Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(77) B.Çile 2007 z~2619 k Buha (15) p.s

Tirs û çavsoriya rijîma Be'is li derbarey Danezana Şamê

Piştî lidarxistina kongira berfireh a Encûmena nîştîmanî ya Danezana Şamê - Îlan Dîmeşq – a rikebir û ji roja 10.12.2007-an de – roja cîhanî ya mafên mirovan – karbidestan li seranserî Sûriyê û li derve , bi gelek hawan dest bi hêrişên berçav û yên neberçav kirin û hê berdewam in , bi hêviya ku karibin vê piletforma demokratîk û pireng ji hev bixin , kar û barê wê belawela , beravêtî û rûreş derînin .

Di derheqê endam û rêvebiriya Encûmenê de , bi hêrs û çavsoriyeke balkêş pêla girtinên keyfî serî hilda , gelek camêr avêtin binê zîndanan û hê girtî mane , weke: 1-Seroka encûmenê xanima hêja Dr.Fida Elhoranî . 2-Nivîskar û çalakvan Ekrem El-bunnî . 3-Dr.Ehmed Tu'imê 4-Nivîskar û siyasetvanê navdar Elî El-Ebdulla . 5-Dr.Welîd El-bunnî . 6-Dr.Yasêr El-Îtî .
7-Mamoste Cebir El-Şofî .
8-Rojnamevan û nivîskar Fayêz Sara .
9-Mamosteyê Endezyar Mihemed Hecî Derwîş.

Ji bilî bi dehan kes yên ku karbidestan ew birine û anîne , hinek çend se'etan , û hinên dî şevekê li ba xwe hêştine , ji nêv wan birêz Raşid Setûf, Xessan Necar, Ûseme Aşûr, Xazî Qedûr, Semîr Neşar, Îsmaîl Omer, Îsmaîl Mihemed, û gelekên dî.

Çêrok çi ye ?

Çêroka vê pêvajoyê , ango rastiya pirsê ewe ku , li 1.12.2007-an li derdora Şamê , cara yekemîn bû ku li hundirê Sûriyê , nûnerên gelek hêzên siyasî , komîteyên civaka sivîl , rewşenbîrên demokrat , kesayetiyên serbixwe û bi beşdarbûna nûnerên partiyên Kurd yên **D.R.(11)**